Rapora YASA ya mehane
Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

Çileya pêşîn 2009

YA§A e.V.

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

YASA e.V.
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org

Izedin Moro

Naverok:

Parêzerê Kurd Mistefa Îsmaîl hate binçavkirin
Welatiyê Kurd Ibrahîm Şêxo hate binçavkirin
Dîsa leşkerekî Kurd hate kuştin
Hejmarek ji endamên serkirdayetiya PYKS hatin girtin
Dadgeha ewlekariya komarê li Şamê sezaya zindanê li çend endamên PYD dibire
Dîsa leşkerî Kurd hate kuştin
Ewlekariya leşkerî xwendekarekî Kurd binçav kir
Dîsa malperek Kurdî ji aliyê ewlekariya Sûriyê ve hate sergirtin

Parêzerê Kurd Mistefa Îsmaîl hate binçavkirin
Di roja Şemiyê de, rêkeftî 12.12.2009an şaxê ewlekariya ezmanî yê bajarê Helebê parêzerê Kurd Mistefa Ismaîl vexwest, da ku pê re vepirsînekê bike. Ji wê demê ve û heya aniha çarenivîsa wî ne diyar e. Li gorî ku malbata wî ragihand, ku sedemên girtina wî ew in, ku M. Ismaîl di warê ragihand, çand, nivîsandina gotarên siyasî de gelekî çalak e û herwiha tê gumankirin ku ew ji ber hevpeyvînên xwe yên di gel kenala ROJ TV de hatiye girtin.

Welatiyê Kurd Ibrahîm Şêxo hate binçavkirin
Hate ragihandin, ku di roja 23.11.2009an de vedrokgerînek girêdayî şaxê ewlekariya komarê-Beşê vexebitîna li dijî Bizdandinê (Terorê), êrîşî mala welatiyê Kurd Ibrahîm Şêxo li taxa Şêx Meqsûd li bajarê Halebê kir. Welatiyê Kurd Ibrahîm Şêxo ji gundê Dewraqlî yê girêdayî nevçeya Efrînê ye, zewicî ye û bavê pênc zarokan e. Heya aniha û li gorî daxuyaniya komîteya MAD a sûrê ya mafên

mirov, malbata wî tu agahiyan derbarê wî nas nake.

Dîsa leşkerekî Kurd hate kuştin
Roja Sêşemê, rêkeftî 08.12.2009an malbata leşkerê Kurd Xelîl Bozan Şêx Muslim nûçeya koçbarkirina kurê xwe wergirt. Xelîl ji navçeya Kobanî ye, lê malbata wî li bajarê Reqayê dijî. Hate ragihandin, ku Xelîl ji beriya çar mehan ve di komek leşkerî de li nêzîkî bajarê Laziqiyê erkê parastina welêt pêk tanî.

Malbata leşker ragihand, ku rayedarên artêşa Sûriyê ji wan re gotine, ku kurê wan bi fîşekekê xwe kuştiye. Lê dema ku li cendekî hate nihêrtin, diyar bû ku ew bi du fîşekan hatiye kuştin!! Ji ber vê yekê guman li ser çîrokên, ku rayedarên artêşê gotine, hene (Li gorî daxuyaniya rêxistina kurdî ji bo parastina mafên mirov û azadiyên giştî li Sûriyê-DAD û malabata leşker). Herwiha DAD û malabata leşker eşkere kirin, ku beriya kuştina wî bi rojekê ji malbata xwe re ragihandi bû, ku ew li leşkeriyê ji hêla serok û hevotvanên xwe gelekî lêdan xwariye û azar bûye û ji malbata xwe xwesti bû, ku kar bikin, da ku cihê leşkeriya wî biguherin.

Hejmarek ji endamên serkirdayetiya PYKS hatin girtin
Di 26.12.2009an de kargêrê navçeya Qamişlo hejmarek ji endamên komîteya siyasî ya Partiya Yekîtî ya Kurd li Sûriyê vexwest, û paşê ew ji bo ewlekariya siyasî ya bajarê Hesiçayê hatin guhastin. Heya aniha sedemên vexwestin û binçavkirina wan ne diyar in. Ne hatine tewanbarkirin, ne jî dadgehkirin. Yên ku hatine girtin ev in:

1- Hesen Salih: Mamosteyek û girtiyekî siyasî kevn e.
2- Mihemed Ehmed Mistefa: Li Qamişlo di sala 1961an de ji dayik bûye û ji beriya 13 salan ve Parêzer e, û ji ber beşdariya wî di çalakiya 26.06.2003an de li pêşiya avahiya UNICEF ji bo zarokan hati bû binçavkirin.
3- Marûf Mele Ehmed: Li Qamişlo di sala 1954an de ji dayik bûye û di 08.12.2007an de ji aliyê ewlekariya komarê ve hati bû binçavkirin û piştî sê mehan hati bû berdan.
4- Enwer Naso: Li Amûdê di sala 1962an ji dayik bûye û wek karmend di kargêriya çandiniyê ya bajarokê Sifeya dixebite, di 30.03.2009an de hati bû binçavkirin û piştî sê mehan hati bû berdan.

Dadgeha ewlekariya komarê li Şamê sezaya zindanê li çend endamên PYD dibire
Di 29.12.2009an de dadgeha ewlekariya komarê ya Şamê sezaya zindanê li çend endamên Partiya Yekîtî ya Demoqrat (PYD) birî. Ew jî ev in:

1- Ciwan Mihemed Ehmed.
2- Hesen Xalid Qido.
3- Menan Ehmed Sîdo.

Hersê bi endamtiya komeleyek siyasî û qedexe (PYD), hewldana parçekirina xaka Sûriyê û girêdana wî parçeyî bi welatekî biyanî ve, afirandina nakokiyan di navbera welatiyan de û arandina şerek û cenegeke navxweyî li Sûriyê, hatin tewanbarkirin û şeş sal sezaya zindanê li wan hate birîn.

Herwiha heman dadgehê biryar di der herqê du endamên din jî de stand ew jî ev in:

1- Xelîl Feydî Delî.
2- Munzir Ebdil Fetah Reşo.

Ew jî bi heman tewanbariyan sezaya çar sal zindan li wan hate birîn.

Dîsa leşkerî Kurd hate kuştin
Di 19.12.2009an malbata leşkerê Kurd Izedîn Moro nûçeya mirina kurê xwe wergirt. Ji wan re hate ragihandin, ku kurê wan di dema pêkanîn erkê parastina welêt de li leşkeriya Sûriyê û di dema hevotên werîzêşê jiyana xwe ji dest daye. Izedîn Moro şû kiriye û bavê zarokekî ye. Ewî piştî neh mehan ji leşkeriyê jiyana xwe ji dest da.

Bi kuştina wî hejmara leşkerên Kurd ên ku di dema pêkanîna leşkeriya Sûriyê de di rewşine nepend de hatine kuştin, dibe 34 leşkerên Kurd. Tenê di sala 2009an de 19 leşker hatine kuştin. Heya aniha tu kes sedemên rasteqîn ên kuştina wan nas nake. Herdemê rayedarên artêşa Sûriyê sedemên kuştinê veşartine û nûçene ne rast derbarê mirina wan weşandine, wek xwekuştina bi fîşekan, rûdanên tirafîkê û Elektrîk.

Ewlekariya leşkerî xwendekarekî Kurd binçav kir
Di 14.12.2009an de vedorgerînek ji revdeya ewlekariya leşkerî ya bajarê Rimêlan li parêzgeha Hesiçayê êrîş bir ser mala xwendekarê Kurd Hevraz Mihemed Emîn Hesen li bajarokê Girkê Legê û ew binçav kir. Herwiha dest avêtin ser gelek tiştên wî yên taybet, wek Computerê wî, bêyî ku belgenameyek fermî ji bo binçavkirina wî hebe!

Dîsa malperek Kurdî ji aliyê ewlekariya Sûriyê ve hate sergirtin
Malpera Soparo www.soparo.com ragihand ku piştî ewê lîneka malpera xwe ya nû www.soparo.ner belav kir bi sê rojan yekser ji aliyê ewlekariya Sûriyê ve hate sergirtin. Tê zanîn, ku piraniya malperên Kurdî li Sûriyê qedexe ne, herwiha gelek malperên din jî, nexasim ên nêzîkî rikberiya Sûriyê, ku li hemberî rêjîmê helwestên xwe diyar dikin.